Cegerxwîn

Welatê min

Welatê min bihişt e kaniya zêr

Belê şêr tê de birçî ne, gur in têr

Kurên Guhderz û Rustem lê perîşan

Di bin destê neyaran têne ber kêr

Nezanî û nexwendin, em birin paş

Ji dexsa yek ji wan carek nebû şêr

Ji dijmin re bi carek dost û bindest

Ji hev re pehlewan û şerker û mêr

Dibênin xelk di ser hewran ve çûne

Niha jî hê newêrin bêne bajêr

Hemî millet bi berjor ve dibazin

Tenê kurdan bi korî dane serjêr

Bi destê dijminan tang û firokan

Di destê wan de xişt û tetri û bêr

Hemî dinya ji cengê re li kar in

Tenê beyhûde mane em xwedî xêr

Eva rî bûye bost û turk nebûn dost

Ji bîr naçin, ne gorn û ne serê mêr

Belê tarîxê va roja me anî

Bi hev re serbilnd rabin bidin dêr

Binêrin xwendevan çawa bilnd in

Li alîkî me mizgeft û yekî dêr